

Heke hûn li dijî COVID-19'ê werin vaksînkirin, dê çi bikin?

Çima divê ez bêm vaxslêdan?

COVID-19 ji vîruseke nû çêdibe ku mirovan enfekte dike. Ji ber vê yekê, em ne şêbexşî enfeksiyonê ne, lewma COVID-19 kari mîna pandemiyê belav bibe.

Tenê di beşek piçûk a nifûsa Danîmarkî de COVID-19 çêbû, û em bi guman nizanin ka kesên ku enfekte bûne bi tevahî paşê ji nû ve ji enfektebûnê têne parastin.

Her kes dikare bi COVID-19 ve enfekte bibe. Û her kes dikare ji COVID-19 nexweş bibe. Lê belê, hin kes bi taybetî riska wan heye ku bi nexweşiyên giran bikevin û bimirin eger enfeksiyonê bigirin.

Daîreya Tenduristiyê ya Danîmarkî pêşniyara vaxslêdanê ya li hember COVID-19 dike ji ber ku ew we li hemberî enfektebûn û nexweşbûna bi COVID-19 diparêze.

Hindî ku zêde mirov bêm vaxslêdan, em ê çêtir bikaribin epîdemiya kontrol bikin.

Vaxslêdan bê pere ye, û bi timamî bi dilxwazî ye ku hûn ê pêşniyara vaxslêdanê qebûl bikin an na.


Vaxslêdan çawa pêk tê?



1. Di dema diyarkirî de li navenda vaxsînkirinê amade bin. Maskeyeke rû û karta xwe ya sîgorta tenduristiyê ya zer binin.



2. Pişporên tenduristiyê yên cuda dikarin vaxsînê bidin, lê ew ê her tim di bin berpirsiyariya bijîşk de kar bikin.



3. Wek yasa, dê vaxslêdan li masûlkeya sermilê te yê sereke were xistin.



4. Piştî ku hûn hatin vaxslêdan, herî kêm 15 deqeyan li wir bimînin ji bo ku heke we karvedanek alerjîk hebe, pişporên tenduristiyê bikarin alîkariya we bikin.

Bandorên kêlekê yê gengaz çi ne?

Hemû vaxlêdan xwedî bandorên kêlekê ne, lê her kesê ku vaxlêdan dibe bandorên kêlekê çênake. Bi giştî, ev bandorên rexekî nerm û demkî ne, û em vaksîna COVID-19 wek vaxsinên pir bi ewle û pir belgekîrî dibînin. Bandorên herî berbilav yê ku mirov dibe ku dema bi vaksîna COVID-19 tê vaxlêdan bibîne, li jêr têne lîstekirin.

Minakên bandorên rexekî yê hevpar	
Bertekên herêmî	Bertekên giştî
<ul style="list-style-type: none">Êş û sorbûna li cihê derziyê	<ul style="list-style-type: none">WestandinSerêşÊşa masûlke û movikêTasarTaya sivik
Minakên bandorên rexekî yê kêmdîtî	
<ul style="list-style-type: none">Bertekên tund ên alerjiyêZehmetiya bênhildanêSorbûna çermWerma rûyê	



Pir kes dê di cihê derziyê de êşê bibînin. Gelek kes dê reaksiyonên giştî yê wek êşa masûlkeyan an jî tayeke biçûk bibînin, ku bi gelemperî nişan didin ku sistema parastina laşê we wekî ku divê bertekê nişanî vaxsinê dide. Eger hûn wan bandorên naskirî û derbasdar bibînin ne hewce ye ku hûn bi doktorê xwe re telefon bikin.

Di kêr rewşan de, dibe ku hûn piştî vaxlêdana xwe tavilê reaksiyona alerjîk a giran bibînin. Eger alerjiya we ya giran a dermanê hebe, wek mînak, beriya ku hûn bî vaxlêdan divê haya we ji vê hebe. Personelên hawarçûnê wê her tim li navendên vaxlêdanê yê COVID-19 li ber dest bin da ku reaksiyonên tund ên alerjîk çareser bikin.


Di navbera zêde xuyabûna kîjan bandorên kêlekê û reaksiyonan û cureyê vaxsinan cudahiyek biçûk heye. Bêtir bixwînin li www.sst.dk/covid-vaccination.

Vaksîn çawa kar dike?


Di nav vaksînên COVID-19 ên ku hatine pejirandin zincîrên biçûk ên koda genetikî ya ji asîdên nukleîk (RNA an DNA) hene, ku bi awayekî xwezayî di laşê mirovan de jî peyde dibin. Ji bo vaksînên Comirnaty® û Spikevax® (berê bi COVID-19 vaksîna Moderna® dihat naskirin), zincîre yê kodê di nav çewriyan de tîn nixandî.

Dema ku zincîrên koda genetikî dikevin xaneyên laş, ew kod ji bo proteînê tê guhartin ku taybet e bi koronavîrusa nû ve. Ew proteîn sistema jêbexşiyê ya laş han dide da ku antîkorên parêzger û hucreyên parastina taybet çêbikin da ku pergala parêzvaniyê vîrusê nas bike û wê bişikîne eger hûn li heyameke din enfeksiyonê bistînin.


Zincîra kodê û madeyên navberê yê vaksînê piştî ku erka xwe pêk anîn ji aliyê laş ve bi lez tîn şikandî.



- 1.** Hejmareke zincîre yê kodan dinva vaksînê de hene



- 2.** Kepsolkirina wê dibe alîkar ku zincîra kodan derbasî hundirê xaneyên laş were kirin. Kepsol piştîre bi enzîmên laş bi lez û bez tê hilweşandin.



- 3.** Zincîrên biçûk ên kodê dibe sedem ku xane proteînên nû çêbibe, ku li derveyî xaneyê bi cih dibin û sistema bergirya laş hişyar dikin ji bo avakirina antîbodiyan û xaneyên din ên bergiriyê.



- 4.** Dijeta û xaneyên bergiriyê dikarin vîrusê biqelişînin eger hûn di demeke din de bi vîrusê bikevin. Dema ku karê xwe bi dawî kir, di xaneyê de zincîra kodê tê şikandin.

Çima divê du caran werim vaksînkirin?

Vaksîn heta 1-2 hefteyan piştî derziya duyemîn bi temamî bi bandor nabe, û ji ber vê yekê divê du caran derzî li we bê xistin.

Em hîn nizanin ka vaksîn heta kengî parastinê dide. Ji ber vê yekê, em nikarin bêjin gelo parastin dê gelek salan bimîne, an dibe ku hûn di demeke din de ji nû ve werin vaksînkirin da ku hûn parastî bimînin.

Piştî ku min vaxlêdan kir, divê haya min ji çi hebe?

Tevî ku hun hatine vaxlêdan jî, divê hûn hîn jî rêberiya giştî ya Rêveberiya Tenduristiyê ya Danîmarkayê bişopînin ku çawa pêşî li bilavbûna vîrûsê bê girtin. Vaksîn %100 bi bandor nîne, û em hîn nizanin ka vaxlêdan di heman demê de rî li we digre ku hûn vîrûsê hilgirin û kesên din tûş bikin an na.






Divê hûn bi doktorê xwe re têkilî çêbikin eger hûn semptomên giran nişan bidin piştî ku hûn hatin vaxlêdan. Ev dibe ku, ji bo nimûne, nişanên alerjîk ên wekî tengasiya nefesê an jî reşbûna çerm be. Doktor dikare binirxîne ka semptom ji ber vaksînê an jî ji ber faktorên din pêk tên, û eger hewce be tedawî dest pê bikin.

Doktorê we mecbûr e ku bandorên kêlekê yê gumanbar ji Ajansa Dermanên Danîmarkayê re ragihîne. Her weha dibe ku hûn bi rêya www.lmst.dk Ajansa Dermanên Danîmarkayê ji bandorên rexekî yê gumanbar agehdar bikin.



Kar bi adetên baş bike

Tevî ku hûn hatine vaksînkirin jî, hîn jî metirsi heye ku hûn kesên din tûş bikin. Ji ber vê yekê, ji bo sînorkirina bilavbûna vîrûsê, divê hûn şopandina rêberiya Rêveberiya Tenduristiyê ya Danîmarkayê bidomînin:

				
Li malê bimîne û test a Coronayê bike heke nişanên nexweşiyê li cem te hebin	Dûr ji hev bisekinin	Pencere û derî vekin û hewayê mala xwe biguherînin	Zû zû destên xwe bişon an jî paqijkera destan bikar binin	Mala xwe gelek caran û baş paqij bikin, bi taybetî ew cihên ku gelek kes dest lê didin

Hûn dikarin li ku derê bersiva pirsên xwe bibînin?

Hûn dikarin her dem agahdariya herî dawî li ser vaxlêdana li dijî COVID-19 li www.sst.dk/covid-vaccination bibînin û bêtir bixwînin li ser koronavîrisa nû û COVID-19 li www.sst.dk/covid.